# ÊŞÊN QEHBIK

Occo MAHABAD

Weşanên Do

Helbest
Êşên Qehbık
Occo Mahabad

Edîtor: Hüseyin Gündüz
Sererastkirin: Hüseyin Gündüz
Berg: Do
Çapa Yekemîn: Nîsan; 2013

Berdan Matbaacılık
Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.
C Blok No: 215
Tel: (0212) 613 12 11
Topkapı/ İstanbul

Weşanên Do
Şehit Muhtar Mah. Nane Sok. No: 5/5
Taksim / İstanbul
Tel: (0212) 243 01 56
Fax: (0212) 252 70 48
Mail: doyayinlari@hotmail.com



# ÊŞÊN QEHBIK

## Occo MAHABAD

*Ji bo hemû êşkêşan…*

**Occo Mahabad** bernamenûs, wergêr, helbestvan û nivîskarekî kurd e.

**Occo Mahabad** di sala 1977′an de li Wan'ê hatiye dinê. Piştî qedandina zanîngeha Stenbolê dest bi nivîsandinê dike.

Her weha di kovarên wekî *Çîrûsk*, *Asiva*, *Pengav* de nivîs û helbestên wî hatine weşandin, dîsa di gelek malperan de nivîskariyê dike û nivîsên wî hatine weşandin û belavkirin.

Ji xêynî helbestan ji bo fîlmên biyanî binnivîsan amede dike. Pir fîlmên biyanî ji aliyê Occo Mahabad ve hatine kurdîkirin.

Çend fîlmên ku ji aliyê wî ve hatine Kurdîkirin:

*Malena

*Rabbit Prof-Fence

*The Road to Guantanamo

Herwiha, Occo Mahabad bi xebatên xwe yên teknîkî ve jî tê nasîn. Heta niha gellek bernameyên kompîturê ji aliyê wî ve hatiye Kurdîkirin. Ji bo standartîzkirina zimanê teknîkî bi salan e xebatan dike. Ji bo fêmkirina jiyana teknîkî e-pirtûkek jî amade kiriye. Pirtûk bi navê *Nivîsên Teknîkî* li ser malperan tê belavkirin.

Çend bernameyên kompîturê ku ji liyê wî ve hatine Kurdîkirin:

*WinRAR

*Ccleaner

*Revo Uninstaller

Occo Mahabad bi helbest, werger, nivîs û gotarên xwe yên cur bi cur jiyana me ya Kurdewarî bi xebatên xwe yên domdar ronî dike.

Pirtûkên wî:

Helbestên Dînik: Weşanên Ava, Adar-2012



**Ez û Tu…**

ez û tu
weke Kurdistanê birîndar û bindest
ez û tu
weke Kurdistanê dagirkirî û talankirî
ez û tu
weke Kurdistanê parçe parçe
ez û tu
weke Kurdistanê birçî û tazî
ez û tu
weke Kurdistanê sefîl û belengaz
ez û tu
weke Kurdistanê berxwedêr û şoreşger
ez qurbana te
ez qurbana Kurdistanê…..

**Mîlîtanek hat kuştin…**

Eyy çiyano
Eyy bajarno
Mîlîtanek hat kuştin ber şevê
Kolan bêdeng
Erd sar bû
Kulîlkek giriya
Dayikek qêriya
Xwîn diherikî axê
Ax ji axiya xwe
Ewr ji ewriya xwe fedî dikir

Eyy birano
Eyy xwişkno
Ew mîlîtan birayê min bû
Bavê çar zarokan
Mêrê jinekê qedirbilind
Şervanê gelekî bindest



Ax birayo birayo
Birayê min ê biçûk
Birayê min ê azadîperest
Birayê min ê welatparêz
Çawa canê te êşandine
Çawa dilê te kêr kirine
Çawa laşê te perçiqandine

Ax birayo birayo
Ax mîlîtano mîlîtano
Bila çavên neyaran kor bin
Bila mala neyaran bişewitin
Çawa te kuştine…

Tu çûyî
Nema
Tehma nên
Siya darê
Xuşexuşa avê
Bax û baxçe
Zevî û westan
Gund û war
Neman birako neman…

Tu çûyî
Çiqas îxanet rûyê me reş
Çiqas qehremanî rûyê me geş kirin
Tu çûyî
Çiqas dem û demsal
Çiqas şivan, berx, gur, kûçik, çeqal derbas bûn
Nizanim…

Birako piştî te
Çend zarok bûn bûk û zava
Çend mal û milk hatin wêrankirin
Çend xewn û xeyal
Çend mirin û jiyîn hatin dîtin
Çend stêrk şemitîn
Çend êş û birîn di dilê me de teqiyan
Nizanim…
Tu çûyî
Diya min reş girê da çil roj
Rûyê xwe çirand
Giriya,
Qêriya
Dîsa giriya
Dîsa qêriya
Nifiran, sixêfan kir
Dîsa nifiran
Dîsa sixêfan kir
Rondik barand bi salan



Tu çûyî
Kenên te mabûn
Di hêlîna dilên me de
Tu çûyî
Tirs û xof
Êş û hesret mabûn
Di çavên me de
Tu çûyî
Dengê te mabû
Di dergûşa guhên me de

“Dayê ez dimirim ji bo we
tu negirî...
ez ê rojekê bi klamên Şakiro
welatekî azad bînim ji we re
negirî dayê negirî...”

Ne klamên Şakiro qediyan
Ne şer
Ne jî girînên dayika min a reben…

## Çav…

çav çawa meriv dikujin dibêjin
lê min dît
çav dikujin
bawer bike
ew çav dibin nêrîn
ew nêrîn dibin qiyametek
wekî birînekê
bi salan dilê te diêşînin
tu çi bikî jî dernakevin
bawer bike
min dît
çav dikujin
ez jî hatim kuştin…



## Gewrê…

Gewrêêêêêê...
ji min re nebêje êş çi ye
êş tu yî
tu...
biçim ku derê êşên te hene
tu heyî
biçim ku derê êşên te êş didin min...

Gewrêêêêêê...
ji min re nebêje birîn çi ye
birîn tu yî
tu...
biçim ku derê birînên te hene
tu heyî...
biçim kuderê birînên te min dixeniqînin...

Gewrêêêêêê...
Êş bûye dengek
Deng bûye talanek
Rihê min diêşîne
Min bênasname dihêle
Êşşşşşşşşş...
Êşek ketiye canê min
Min parçe parçe dike
Êşşşşşşşşş...

Gewrê bila rindiya te serê te bixwe
Diçim nabe
Disekinim nabe
Têm nabe
Dikenim nabe
Digirîm nabe
Çi dikim nabe
Gewrê Gewrê bila rindiya te serê te bixwe...



Gewrê biçim kîjan bajêr
Wekî kûçikekî beredayî
Wekî kûçikekî bêxwedî
Têm qewirandin
Têm perçiqandin
Her bajar hesabê tenêtiya te ji min dipirse
Ciwanek navê te diqîre
Wekî tolazan qeşmeriyan dike
Zarokek behsa çavên te yên hûrik hûrik dike
Her bajar qala kenên te yên kevokî dike
Her bajar bûye dijminê min
Yekî şeqamek li rûyê min xist
Heta ku min bide girînê
Bi têra xwe li min xist
Bi kenên devgilêz
Sekinî û çû…

Qibraxek di nava bênamûsiyê de
Di nava bêexlaqiyê de
Behsa delaliya eşqê dikir
Lê ne xema min bû
Kî bênamûs an jî bêexlaq bû
Bajarên durû yên wekî sofiyên gunehkar durû jî
Hesabê tenêtiya te ji min dipirsin…

Ax Gewrê Gewrê
Xwedê te nehêle
Ew bajar çi ji min dixwazin
Çima min rehet nahêlin
Biçim kîjan bajêr
Wekî kûçikekî beredayî
Têm qewirandin
Têm perçiqandin…
Murîdekî belavokên cemaetekê belav dikir
Li ser nivîsandibû
-Kûçîkek Gewrê terikand-
Qêriyam
Bawer nekin-derew e
Hatim şermezarkirin
"Kewaşe-pêxas-bêşerm-bêmîrat-qûşxane-qeşmer…."

Ax Gewrê Gewrê
Rindiya te bikeve bin erdê
Her bajar  bûye murîdên te
Murîdên te tû dikin rûyê min…
Kalek bi kufiran bi min re xeber da
Te dît
Kew xwe dikujin
Her saet kewek xwe dikuje
Şerm bike rezîl
Te çawa Gewrê tenê hişt
Gewrê kew jî hesabê tenêtiya te ji min dipirsin
Kew jî bûne dijminê min
Her roj kew xwe dikujin…



Jinek xwe avêt ber lingên min
Kincên xwe çirand
Xwe tazî kir
Min berê bawer nekir
Rûyê wê
Weke rûyê te bû
Memikên wê
Weke memikên te bûn
Bedena wê
Weke bedena te bû
Biçim kîjan bajêr jin xwe tazî dikin
jin bi laşê te digerin
Jin porên xwe jê dikin
Her jin bêhna te tîne
Dîn dibim
Bi kenên te dikenin
Rezîl dibim
Bi awirên te dinêrin
Şaş û metel dimînim
Biçim kîjan bajêr qala maçên te dikin
Biçim kîjan bajêr hêstirên çavên te nîşanî min didin…

Off off offf Gewrê
Bila rindiya te serê te bixwe
Bila çavên te birijin
Biçim kîjan bajêr
Wekî kûçikên beredayî
Wekî kûçikên bêxwedî
Têm qewirandin
Têm perçiqandin
Her bajar hesabê tenêtiya te ji min dipirse….

Her bajar strana ku min ji te re nivîsandibû distrê…

“Ax Gewrê Gewrê tu nabî bûka dilê min
Gewrê şerek qewimî li pişt çiyayê qerejdaxê
Mal û milk bûn wêran Gewrê
Gewrê Gewrê dil avêt Gewrê
Gewrê Gewrê şer çêbû Gewrê
Gewrê Gewrê te mala min şewitand Gewrê…”



**Ji devê kalekî Diyarbekirî…**

Kurê min cixare te nakuje,
Qehrên jinan
Derdên jinan
Derewên jinan
Êşên jinan
Lêvên jinan
Memikên jinan te DIKUJIN...

**Kî/Kê?**

Min tu hez kir ku
Tu
Bi tenê ya min bî
Min tu hez kir ku
Tu
Bi tenê
min hembêz bikî
Ax emannn emannn…
Ax lê lê-lê lê…
Kî dikare me
Bi qasî me fêm bike
Kî dikare me
Bi qasî me birîndar bike
Tu wekî demê yî
Bi qasî demê zilimkar
Bi qasî demê demdemî
Nizanim
Dibe ku
Zilma te
Ji ber hezkirinê be



Lê
Bi çavên xwe
Li min dinêrî
Erd diheje
Fêlbaz fêlbaz dikenî
Min dixapînî
Dilê min diheje
Maç dikî
Wekî xezalekê tî
Ez dihejim

Ax emannn emannn…
Ax lê lê-lê lê…

Kî dikare me
Bi qasî me hez bike
Kî dikare me
Bi qasî me biêşîne
Erê kî/kê?

**Dayê…**

Dayê dayê qurbanê
Tu nizanî
Çi hat serê min ê belengaz
Çi hat serê min ê bêbext
Dayê dayê qurbanê
Kêra qehbikekê
Di dilê min de
Çikyayî maye
Kaş dikim
Dernakeve...

Dayê dayê qurbanê
Dilê min kiriye kewek
Xistiye qefesa xwe
Bi min re
Bi derewan
Bi xapandinan dileyize...

Dayê dayê qurbanê
Destên min bigire
Bigire ku
Ez kêra wê qehbikê derxînim
Kêra qehbikekê
Di dilê min de çikyayî maye...



**Ji bo bîranîna şaîrên ku xwe kuştine…**

Min çiqas li xwe geriya ewqas winda kir
Tu bajar min nehewand
Tu qehpik paşila xwe venekir dilê min
Yan min dida pey kesên şaş
Yan jî diketim rêyên şaş
Tu rawestgeh nebû dermanê êşên min
Min çiqas li xwe geriya ewqas winda kir

Bajarek nema
Jinek nema
Fikrek nema ku
Aramiyek bide destên min

Eyyyy xwendevan !!!
Tu niha
Merivekî ku xwe digere dibînî
Merivekî ku ji zanebûnan hatiye ber nebûnan hîs dikî
Mayakowskî berî mirina xwe
Dinêre derdorê
Difikire
Dinivîse
“êdî tu wateya jiyanê nema”

Gelo
Ez ê bi kîjan çekê xwe bikujim
Gelo
Ez ê kîjan nivîsan deynim ser maseya xwe
Gelo
Ez ê ji kê xatir bixwazim
Niha
Li cihekî wisa me
Ne ez mame
Ne jî pêşeroj

Eyyyy xwendevan!!!
Westiyame
Parçe parçe me
Wenda me
Li ber xwekuştinê me
Gelo
Ez kîjan çekê bi kar bînim...



**Ka?**

Tu kulîlkek bû
Min tu bêhn dikir
Ka kulîlka min ka?
Ka tu li ku yî ka?

Niha kî bêhna te dikşîne cegera xwe
Kî te hembêz dike
Kî lêvên te gez dike
Kî di çavên te de xwe dikuje
Kî bi destên te dilê xwe germ dike
Kî kî kî?

Tu kulîlkek bû
Ka bêhna te
Ka tu
Ka evîna me
Ka kenên te
Ka ka ka
Ka kulîlka min ka?

**Name…**

Ji min re nameyekê binivîse
Bila di nav de
Rondikên çavên te hebin
Ez ê bi rondikên te re biaxivim
Ew ê ji min re êşên hesretên te vebêjin
Ez ê herroj rondikek vexwim
Êşên xwe
Hesretên xwe ji bîr bikim...

Ji min re nameyekê binivîse
Bila di nav de porên te yên jêkirî hebin
Ez ê porên te belav bikim bayê sibehê
Biçim kuderê
Bêhna porên te wê bi min re be
Ez ê bi bêhna te dilê xwe şa bikim



Ji min re nameyekê binivîse
Bila di nav de destmalek hebe
Wê destmalê lêxe bedena xwe ya nazenîn
Ez ê herşev di bedena xwe de te hîs bikim
Ez ê bi desmala te ve
Xwe ji nû ve biafirînim

Ji min re nameyekê binivîse
Bila di nav de
Çavên te yên melûl
Destên te yên biçûk
Lêvên te yên agirî hebin
Bila di nav de
Êşên te
Hesretên te
Hezkirinên te hebin

Ji min re nameyekê binivîse
Bila di nav de tew tu hebî
Ez ê her û her te bixwînim
Te bibînim
Te hîs bikim…

**Çûyîn…**

Min got neçe
Ew çû
Wê got bimîne
Ez çûm...

Ew çû
Ez giriyam
Çavên wê
Di çavên min de man
Bêhna min
Di tiliyên wê de ma

Ez çûm
Ew giriya
Dengê min
Di dengê wê de ma
Xwêdana wê
Di bedena min de ma…



**Reşikê…**

Çima îşev destên te
Xayin xayin hez dikin
Çima tu xayin xayin dikenî
Çima kulîlkên te
Xayin xayin bêhn didin

Reşê Reşikê
Porreşikê
Rûreşikê
Çavreşikê
Mijangreşikê

Ka bêje
Kî berxikên çavên te
Bazar bi bazar firotiye
Kî helbestên rêkirî
Şev bi şev kuştiye
Kî klamên hembêzkirî
Kêlik bi kêlik girandiye

Reşê Reşikê
Tu reşik î
Xayintî ne li gorî te ye
Ka bêje
Kî te êşandiye bi dilê xwe
Kî te xapandiye bi peyvên xwe
Kî bi gunehên xwe
Gunehên te şuştiye…

Oyy oyy Reşikê
Ma tu nabînî
Min hembêza xwe vekiriye
ji bo hêstirên çavên te
Ma tu hîs nakî
Dikarim
Her tiştên xwe bidim te
Dikarim
Wekî mirinekê te hez bikim

Reşê Reşikê
Dilreşikê
Rondikreşikê
Kenreşikê
De bêje
Çima tu wiha perîşan î
Bi perîşaniya xwe
Min jî dikî perîşan…



**Nahêlin…**

Canê min
Nahêlin
Em bextewar bin
Dibêjin “bajar dişewitin”
Dilê min
Nahêlin
Em pev re şa bin
Dibêjin “mirov tên kuştin”
Awirên min
Nahêlin
Em emrê hev bixwin
Dibêjin “bombe tên teqandin”
Destên min
Nahêlin
Em ji hev hez bikin
Dibêjin “şer heye”
Nahêlin dilê min nahêlin
Min nahêlin
Te nahêlin…

**Bêbavê…**

Di çavên te yên kilkirî de
Hespên boz dibezin
Siwar dibim bi esmeriya xwe ve
Tu diwestî
Ez diwestim
Êş xwe dikuje…

Di porên te yên reş de
Bêhna sosinan digerin
Bêhna te
Bedena min dagir dike
Lêvên min îsyan dikin
Peyvên veşartî bêwate dimînin
Heyv dinale
Roj dimire
Hesret diqede
Tu dikenî
Ez dikenim…



Destên min diherikin destên te
Destên te maç dikim
Şerm dikî
Diricifim
Tu dîsa şerm dikî
Ez dîsa diricifim…

Gotinek belav dibe dilê te
“Bêbavê
De bikene
Ez hatim”
Tu dîsa dikenî
Min hembêz dikî…

**Navê te…**

Di dûya cixareya min de
Navê te bûye gulekê spî
Te dikşînim
Te bêhn dikim
Te difikirim
Te hembêz dikim…



**Çendî çend…**

Çendî çend birîn
Çendî çend keser
Wisa derbeder
Wisa biêş
Wisa xerîb
Ew wisa mîna qulingekê
Ref bi ref
Dûr û kûr
Difire bi nazenîn
Çendî çend maç
Bêderman
Çendî çend gez
Bêziman
Wisa şermok
Wisa qeşagirtî
Wisa ricifî
Ew wisa mîna simbulekê
Pêl bi pêl
Wisa bêhndar û nazdar
Vedibe bi şikestî

Lewma tehma wê
Weke asoyekê bêdawî
Weke demekê domdar e
Lewma hebûna wê
Weke seyranekê bêhnvedayî
Weke qûntarekê bêxem e
Lewma
Nayê jibîrkirin destên alastî
Çavên lênêrî
Gezên xençerî
Lewma
Şev geh siwar
Geh bi per û bask e
Lewma
Por belawelayî
Bisk bi xêzî
Kezî hewrişîmî ye



Çendî çend şev
Di bedena min de
Ew bêderman
Çendî çend şev
Li ser lêvên min
Rengdar û herikbar
Wisa badayî
Wisa xezebî
Wisa malmîratî
Ew wisa mîna genimekî
Tijî jiyan
Tijî ked
Ewqas jî tehmdar
Lewma têk diçûm her şev
Di nivînên wê de
Gewrî zuha û tî
Beden westiyayî û bextewar

Çendî çend şev
Dibûm koçber
Dibûm rûpeleke xwendî
Dibûm zinareke pevşabûnkêş
Çendî çend şev
Dojeh dibû cenet
Lêv dibû azadî
Çol dibû mêrg
Deng û qêrîn dibûn
Careke din…careke din…
Şingîniya dengê wê
Wekî teresbavekî xapînok
Wendayî û bêkes
Xwe diavêt li ber dilê min



Çendî çend şev
Dîroka pevşabûnên me
Sariya birînan dikewand
Min dikir leylan
Dikir baraneke têr û tijî
Dikir tirî û şerab
Dikir esman û kevok
Dikir war û yar
Lewma
Tov dihat avêtin
Av dihat dayîn
Erd dihat cotkirin
Çendî çend şev
Ew weke zeviyekê
Bêav û bêşîn

Ew wekî wargehekê
Bêdar û bêbaran
Ew weke siwarekê
Dida pey evînê
Bê perva
Dest û dev birçî
Xov û hov
Bi ax û wax
Bi per û bask
Bi sing û ber
Lê bi camêrane
Çendî çend şev pê re
Bêje dibû zindî
Temen dibû pirsek
Bersiv dibû
"Ez ji te hez dikim"



Çendî çend şev pê re
Fedî xelas dibû
Can hogiriyê dikir
Tenêtî gazinan diqewirand
Wê çaxê
Xerabî dibû qencî
Xeletî dibû rastî
Hesret dibû demekê derbasbûyî
Çav dibû stêrk
Ken dibû berbang
Dest dibû pêdivî
Maç dibû şêranî
Min tucarî wan şevan ji bîr nekir
Tucarî şev me nexeyidî
Me tucarî neheqiyê nekir
Ji evînên qedexe re

Çendî çend şev e
Ez hê jî
Xafik û dahfikên tenêtiya dilê xwe
Bi wan şevan re ji bîr dikim
Çendî çend şev derbas bûn
Lê
Ew derbas nebû
Çendî çend şev qediyan
Lê
Agirê evîna wê neqediya
Ez hê jî
Pê re dikenim
Pê re asîmanan temaşe dikim
Pê re hêvîdar û jîndar im
Çendî çend şev derbas bin jî
Ew  hê jî
Li min derbas nebûye…



**Ax kafir ax...**

Ji bo te
Ji cenetê hatim qewirandin

Ax kafir ax
Tu çima evqas xweşik dikenî
Çima çima çima...

Ax kafir ax
Tu çima evqas xweşik digirî
Çima çima çima...

Xwezî min maçên tazî bavêta ber lêvên te
Xwezî xwezî xwezî...

Xwezî min di hembêza te de xwe veşêrta
Xwezî xwezî xwezî...

Ax kafir ax
Bila cenet yên wan bin
Tu ya min be bes e
Tu destên min bigire bes e...
Bes e bes e bes e…

**Wîjdan…**

Ji bo ku te ji bîr bikim
Min xwe diavêt nivîna her jinê
Şev xayîn bû
Şev dikeniya
Şev tolaz bû.
Dengê girînên te
Dijmin dijmin
Dilop bi dilop
Diket li ser dilê min ê rezîl
Dil tarî bû
Diqîriya
Jan dida.

Wîjdan di nava şevên bênamûs de
Dibû kujerekî bêbext
Min hinekî te dikuşt
Hinekî xwe
Hinekî jinên şevê
Şev serxweş
Ez kew
Her jin nêçîrvan bû.



Ji bo ku te ji bîr bikim
Min lêvên her jinê dimijand
Şev şerm dikir
Lêv şerm nedikir
Lêv qerisî
Lêv qermiçî bû
Lêv bi derewan maç dikir.
Di nava şevên bênamûs de
Her deng dibû dengê te
Her jin dibû bedena te
Lê
Ne awirên te yên qehbikî hebûn
nNe destên te yên biçûk
Ne jî germahiyên te.

Ji bo ku te ji bîr bikim
Dibûm riswa
Dibûm qeşmer
Dibûm bahoz
Lê
Min çi dikir te ji bîr nedikir
Dicemidim
Ka hembêza te
Ka kenên te...

**Evîn herimî…**

Bila çavên te ji min re bibin heram
Ji min re bibin jehr û xençer
Ez ê îşev hemû helbestên xwe bişewitînim
Hemû bîranînên xwe
Belav bikim li ser dilê te yê herimî
Herimî dengê te
Herimî kenên te
Herimî awirên te
Evîn herimî...

Bila îcar çavên te birijin
A niha
Tu dikarî herî
Paşilên din bextewar bikî
Dev û lêvên din nas bikî
Lê te îcar gunehê min stend
A niha
Tu dikarî bi çavên din aram bibî
Ken û awirên din xwe bixapînî
Bila rêya te vekirîbe
Lê te îcar gunehê min stend
Dîsa dibêjim bila îcar çavên te birijin
Rêya te vekirîbe... bi xatirê te...



**Kîjan…**

Kîjan pirtûk dikare tehma bedena te binivîse
Kîjan helbest dikare behsa germahiya awirên te bike
Kîjan felsefe dikare rengê kenên te vebêje
Porxelekê
Bayeke sar bêhna te tîne
Nizanim ji me kî serxweş e
Ba yan jî ez?
Nizanim ji me kî bextewar e
Tu yan jî ez…

**Esmerê…**

Esmerê
Dilê xwe nede dilê min
Kî hat dengê min dizî
Kî hat xewnên min kuşt...

Kî hat derewan kir
Kî hat dilê min xapand
Kî hat parçe parçe kir û çû…

Esmerê
Min hemû wateyên xwe winda kir
Ne dikarim te hez bikim
Ne jî yekê din
Ne dikarim te bextewar bikim
Ne jî yekê din
Herkes êşên xwe da
Herkes ji min tiştekî bir
Nikarim birînên te baş bikim
Nikarim te fêm bikim
Nikarim-nikarim-nikarim
Bibore ji destê min nayê
Nikarim
Ziman lal
Dil qehbik
Ez wenda me
Ez ne ez im…



Esmerê
Ez ne wekî Bav Tahirê Uryan
Dikarim evîna te
Bi rût û tazî
Bi xwendina helbestan bidim jiyandin…
Ne jî Feqiyê Teyran im
Xwe bikim xulamê teyran
Bi zimanên wan stranan bistrêm…
Neêşe
Tu girîn
Tu nifir
Tu gotin
Tu peyv
Nakeve dilê min ê hişk û sar

Nebêje
Em jî dikarin wekî Xanî
Çîroka Mem û Zînê binivîsin
Ne ez Mem im
Çavên te
Têxim zîndana çavên xwe
Ne jî tu Zînê yî
Ji bêrîkirinê
Êş bi êş
Jan bi jan
Rondikên xwe vexwî
Bi wan keleya evînê xurt û gur bikî…

Hiş be
Qala Cegerxwîn neke
Ez nikarim bibim şivanê wî jî
Ez herimîme
Qirêj girtime
Nikarim wekî Cegerxwîn
Devên te yên şekirî
Lêvên te yên dimisî û hingivî
Deynim taştêya sibehê
Bi kêf û şahiyan
Rojên xwe derbas bikim…

Deng neke
Guhdar bike
Melayê Cizîrî
Di nava destên yarê de
Xwe dibîne
Xwe winda dike
Ayetên eşqê dinivîse
Xwe davêje deryaya hesret û êşan…

Bateyî di porên yarê de
Hêlînan çêdike
Xwe dadiliqîne mijangên reş û xweşik
Dibe baran
Dibare
Bedena yarê bi rondikên xwe dişo…



Esmerê
Ez ne Cizîrî me
Ne jî Bateyî
Ne dikarim te hez bikim
Ne jî yekê din
Ne dikarim te bextewar bikim
Ne jî yekê din…

Te hê jî fêm nekiribe
Behsa çi dikim
Çi bibêjim
De bigirî
De nifiran bike
De dûjinan bike
Lê
Bizanibe ku
Eşqa ku tu digerî
Ew ne ez im
Evîna ku tu hesreta wê dikişînî
Ew ne ez im
Nabînim
Nabihîsim
Çilmisîme
Qerisîme
Mirime….
Ne dikarim te hez bikim
Ne jî yekê din
Ne dikarim te bextewar bikim
Ne jî yekê din…

## Mixabin…

Tu li min veşartî yî
Weke payizekê sar
Weke fikrekê nexweş
Di hişê min de
Bi her tiştên xwe ve
Tu heyî… tu veşartî yî

Li gorî min
Belengaziyeke rewşa min
Mixabin
Ez ji vê belengaziyê hez dikim
Dizanim
Bûme êsirê dilê te
Mixabin
Ez vê êsirtiyê dixwazim
Mixabin
Nikarim dev ji te berdim…
Mixabin
Tu li min veşartî yî…



## Bilûrê bilûrê…

Bilûrê bilûrê
Îro ji bo min lêxe
ji bo min bigirî
Kenên ku ez veşêrim
Êşên ku derman bikim
Helbestên ku bişewitînim hene

Bilûrê bilûrê
Îro ji bo min gazinan bike
ji bo min nifiran bike
Eşq qediya
Ez qediyam

Hestên ku divê ez ji bîr bikim
Tehmên ku bikujim
Destên ku jê birevim
Bîranînên ku bişewitînim hene

Bilûrê bilûrê
Îri ji bo min lêxe
Ji bo min bigirî
Eşq qediya
Ez qediyam
Wêran
Dêran
Bêbext ez im…

## Ew…

Helbestek dinivîsim di nav de ew heye
Çavek li min dinêre ew
Dengê kenekê tê ew
Awirekî tûj derbas dibe ew
Bêhnek diqîre ew
Weyy Xwedêyooo!!!
Çima ew çima?

Çima ez nikarim xwe jê xelas bikim
Hertişt ew e
Ew ew ew…
Herder ew e
Ew ew ew…
Her jin ew e
Ew ew ew…
Weyy Xwedêyooo!!!
Sûcê min çi ye?
Ew çi guneh e ketiye stûyê min
Çima ez nikarim jê birevim
Çima Xwedêyooo çima?



## Her cure qirêjî û gemarî…

Îro derketim derve
Li her derê bajêr
Ewteewta însanan
Qîreqîra jinikan
Cirecira zarokan
Xirecira qibraxan
Pistepista fahişeyan
Her cure qirêjî û gemarî
Bi her awayî deng û gazin

Yekî çêran dikir
-Memoyê bênamûs çav berdaye qîza min-

Zarokek digiriya
-Kuro Miho perê min bide-

Dayikek hêrs dibû
-Kurê sa zû bike-

Mêrek bi jina xwe re şer dikir
-Orispî ew çi boyax e-

Tucarekî qurre diranên xwe paqij dikir
-Oxx dinya çi xweşik e-

Yekî çopan kom dikir
-Çima ez çima-

Yekî bîra vedixwar
-Qîzê Eyşo te ez kuştim-

Qibraxek jinek difirot
-Werin şahiya şevê 80 TL-

Îro derketim derve
Li her derê bajêr
Herkes herkesî dixwe
Herkes ji xwe direve
Herkes dişibe herkesî

Îro derketim derve
Li her derê bajêr
Rezîltî û beredayîtî
Ewteewta însanan
Her cure qirêjî û gemarî…



**Malkambaxê…**

Carinan wisa dixwazim bigirîm
Dibêjim bigirî dilê min bigirî
Bi têra xwe bigirî
Heta sibê bigirî
Paşê tu têyî bîra min
Hêrs dibim
Diqehirim
Kufirek dikim
“fahişeya herkesî”
Nifirek dikim
“Xwedê bela xwe bide te”

Cixareyek dikişînim
Qedehek araq vedixwim
Li stêrkan dinêrim
Destên xwe dinêrim
Serê xwe ditewînim
Dîsa dixwazim bigîrim
Dîsa dîsa dîsa lê çênabe

Malkambaxê
Fêm dikim ku
Bi te jî tenê me bê te jî
Bi te jî ne bextewar im bê te jî
Bi te jî belengaz im bê te jî…

**Eşq çi ye?**

Eşq çi ye dosto?
Eşq helbestên şairekî ye
Êş dikişîne qelema wî
Xwîn diherikîne kaxizên wî
Qelem ji êşan dikene
Kaxiz ji xwînan digirî…

Eşq çi ye dosto?
Eşq di destê karkerekî de
Kedên rojane ye
Ew ked dibe nan
Tê li ber zarokên wî
Karker şa dibe
Zarok bextewar dibin…

Eşq çi ye dosto?
Eşq aştiyek e
Dayik dikevin aramiyekê
Bi mirinan natirsin
Li benda kuştina zarokên xwe namînin
Bi tirs û xofan najîn…



Eşq çi ye dosto?
Eşq hesret e
Di navbera du evîndaran de
Gihîştina destan
Maçîkirina lêvan
Germahiyeke bêdawî
Hêstirên çavan e
Ew hesret e ku
Nivînan germ
Bedenan rehet dike…

Eşq çi ye dosto?
Eşq baweriyek e
Ew bawerî ye ku
Dinyayê diguherîne
Civatek tê ser hişê xwe
Tijî armanc dibe
Di rêyeke rast de dimeşe
Jiyaneke nû û azad ava dike…

Eşq çi ye dosto?
Eşq hezkirina xwezayê ye
Bêhnkirina kulîlkan
Siya daran
Temaşekirina çeman e
Ew xweza ye ku
Can dide mirovahiyê
Rojên me ronî dike…

Eşq çi ye dosto?
Eşq jiyan e
Ew jiyan e ku
Mirinê ji me re dide jibîrkirin
Her roj
Me girê dide dost û hevalan
Dibe sifreya malbatekê
Hembêza jinekê an jî mêrekî…

Dosto!!!
Tu carî ji bîr neke
Ji dilên orispîbûyî eşq
Ji bedenên orispîbûyî sedeqat dernakeve
Tu tu be
Nekeve pey dilên orispîbûyî
Encam: ezîyet û êş e
Tu tu be
Neçe pey bedenên orispîbûyî
Encam: xapandin û derew e…



**Ka tu yê îcar jî bikaribî bêdeng bimînî?**

Ez ê wekî dengbêjekî kor
Bi tiliyên xwe
Wateyên dilê te bixwînim
Bi dengê xwe yê girî û zîz
Bigihîjim dilê te yê hişk û sar
Çi bibêjim kêm dibe
Çi bê nivîsandin kêm dimîne
Divê gotin li ser avê were nivîsandin

Ez ê wekî dengbêjekî kor
Gotinên dilê xwe yê reben
Binivîsim li ser avê
Wê tu carî neyê jibîrkirin
Wê tu carî neyê jêbirin
Tu yê di nava her avan de
Eşq û evîna min bibînî
Ka tu yê îcar birevî ku
Ka tu yê îcar biçî ku
Ka tu yê îcar çawa nivîsên li ser avê rakî?
Ka tu yê îcar jî bikaribî bêdeng bimînî?

**Şev…**

Emrekî pîç e îro şev
A niha
Ketime li pey pevşabûneke îllegal
Yan ew ê min heps bike
Yan jî ez ê wê…
Weke bombeyekê bisaet qeşmer e bedena min
Yan ez ê wê biteqînim
Yan jî ew ê min…

Xapandineke tolaz e lêvên min
Bi maçên qedexe diricifin
Stranên derewan distrên
Bi xeyalên nîvcomayî
Weke çivîkên kuştî
Bêhn didin di hişê min de…

Orispî ye îro şev
Bêedeb e hem jî belengaz
Bêşerm e hem jî şox
Reqs dike hem jî dînik
Yan ez ê têk biçim
Yan jî ew ê bi ser bikeve…



Durû ye îro şev
Di nava sextekariyê de
Behsa duristiyê dike
Ez telaqek davêjim
Rût û tazî
Ew telaqek digire
Şilfîtazî
Ez sozek xera dikim
Rût û tazî
Ew sozek digire
Şilfîtazî…

Jineke tazî ye îro şev
Porreş
Boyaxkirî
Dest û tilî biçûk
Dînik û xayîn
Hem nazdar
Hem rêzdar
Hem jî şêt
Ba dike
Diçîne
Diwestîne

Çîrokeke beredayî ye îro şev
Carinan şevger
Carinan weke avekê aramdar
Carinan wekî gunehekî reş
Carinan wekî rûyekî spî ye…

Şev îja tu yî tu
Destên xwe li nava destên min bixe
Bila dest bikenin
Çavên xwe li nava çavên min bixe
Bila çav dîn bin
Nazên xwe li nava dilê min bixe
Bila hesret coşdar bin
Devê xwe li nava lêvên min bixe
Bila lêv bi te re têr bin
Bi te mest bin…

Şev îja tu yî tu
Hatina te xweş
Çûyîna te êş e
Ne bi te dibe
Ne jî bê te
Roj bê te derbas nabin
Şev bi te naqedin
Tu fêm nakî
Şev îja tu yî tu…



**Here…**

Keçikê keçikê
Tu bimirî porkurê
Dilê min çiyayek bû
Te hilweşand
De here

Keçikê keçikê
Ji kerema xwe
Qulingên dilê min bihêle
Wisa here…

Keçikê keçikê
Ji kerema xwe
Rondikên çavên min têxe şuşeyekê
Ji min re bişîne
Wisa here…

Keçikê keçikê
Bêzar bûme
Ji hezkirinên sexte
Bêzar bûme
Ji çavên derewkar
Bêzar bûme
Ji jiyana kambax
Ji kerema xwe
Derd û qehrên xwe hilde
Wisa here…



**Tenê me…**

Bajarek heye
Bi hezaran kolan e
Di nav de bi mîlyonan qerebalix
Lê
Ez ji kûçikan berbattir tenê me

Jinek heye
Dilê min girtiye
Devê min maç dike
Bi germahiya xwe hembêz dike
Nivîna min germ dike
Lê
Ez ji çivîkan zehftir tenê me

Destên min digire; tenê me
Dikene; tenê me
Diaxive; tenê me
Li min dinêre
Weke zarokan şa dibe
Lê
Ez ji çiyayan bilindtir tenê me

Ditirsim
Rojekê
Ev tenêtiya min a orispî
Qerebalixên dilê wê bikuje
Ew jî bimire…



**Jinek û ez…**

Jîletek-esrarek-şerabek
Jinek û ez
Dûya esrarê reqs dike li nava odeyê
Straneke erebesk êşên min diçirîne
Êvar gêj bûye wekî min
Jîletek bêdengiya êvarê diqelişîne
“Şeq şeq şeq”
Ji milên jêkirî xwîn diherikin
Hêdî hêdî…

Jinek diqîre
Digirî
Dijûnan dike
Bi vexwarina şerabê ve
Xwîna xwe dirijîne rûyê min
“Bênamûs tu kî yî min biterikînî”
Bêdengiyeke jehrî çêdibe…

Dîsa esrar tê kişandin
Dîsa şerab tê vexwarin
Dîsa jîlet tê lêxistin
Dîsa qêrîn û girîn
“Bêşeref ka hezkirina te”
Jîletek-esrarek-şerabek
Jinek û ez…

Jin belengaz
Ez belengaz
Êvar belengaz…



**Li ser çarîna Bav Tahirê Uryan (Hemedanî)…**

Ey dîlberê
Gerdenloqumê
De bêje

Devê te şekir be
Şerbet çi ye?

Lêvê te mey be
Meyxane çi ye?

Dêma te sorgulî be
Gulistan çi ye?

Zimanê te cenet be
Cehenem çi ye?

Bejna te heyv be
Dinya çi ye?

Evîna te dil be
Dilrevîn çi ye?

Derdê min tu bî
Derman çi ye?

War û malê te ez bim
Çima disekinî?



**Tu digiriya…**

Tu digiriya
Dengê te jî digiriya
Dengê te
Dilê min sêwî dihişt

Di dengê te de
Gotinên veşartî
Dilê min diperçiqandin
Di awirên te de
Nêrînên watedar
Rihê min parçe parçe dikirin

Tu digiriya
Ez dihatim dorpêçkirin
Ez dihatim dagirkirin
Xwedê jî hewara min nedibihîst
Xwedê jî xeyidîbû û guhdar nedikir…

Ewqas rondik di dilê min de
Dibûn xwîn
Dibûn derd
Dibûn veqetîn
Dihatim xeniqandin

Rondikên te
Dibû payîzeke sar
Dibû axeke qeşagirtî
Pelên dilê min diweşandin
Stûyê min xwar dikirin

Niha demsalan
Navê te diqîrin
Li aliyekî bîranînên te
Li aliyekî rondikên çavên min
Bêkes û bêxwedî ne

Ez xeman dijimêrim
Di xema yekemîn de
Xemên awirên te hebûn
Ya li duyemîn
Tenêtiya destên min
Ya li sêyemîn
Xemên rondikên te

Min îro nameyek nivîsand
Di nav de
Rondikên çavên min hebûn
Êş bi êş
Jan bi jan
Kul bi kul



Min rondikên çavên xwe
Bi dilê xwe yê şikestî ve
Ji te re şand
Tu yê jî bibînî
Di nava her dilopan de
Birînên nekewandî hene

Dibe ku xêzên destên te
Wekî deqekî
Li ser dilopan jî hebin
Gengaz e
Her tişt dibe
Ji ber ku xwîn jî heye
Xwîna ku te ji dilê min stendibû

Gelo tu yê bikaribî
Êşên rondikên min bixwînî
Gelo tu yê jî
Bikaribî bi têra xwe bigirî
Wekî min

Min xwest ku
Di rondikên min de
Gotinên ku tu fêm nakî bibînî
Gotinên ku nakevin dilê te hîs bikî
Bi rondikên min ve biaxivî
Gelo
Tu yê bikaribî
Gotinên rondikên min guhdarî bikî?

## **Te nedixwest dem biqede**

Hestên malkambax
Wekî hespekî kihêl
Dibeziya li ser nivînên te
Bi çargavî
Bi kezebşewitî
Bi kenên lerizî û ecêb
Te nedixwest dem biqede
Agir bitemire
Qêrîn bi dawî bibe…
Kinc dihatin çirandin
Lêv dihatin mijandin
Erdnîgariyek dihat kêşfkirin
Bêriyên bêdawî
Di nava şox û şenga bedena te de
Dibûn
Şahbaz
Awirbaz
Kenbaz



Dereke min e geznebûyî
Derdekî min î xelasnebûyî nedima
Wê çaxê
Min fêm dikir ku
Te dixwest
Hezkirin jî bi azad çêbe
Jiyan jî…

Min digot
Tev tu yî taştêya sibehê
Tev tu yî rûnê malê
Tev tu yî
Hingiva ber devan.

Di şêweya hezkirina te de
Ne derd diman
Ne jî qehr û keder
Barê giran yê jiyanê
Bi te re siviktir dibû
Pênûs bi te
Kêf û şahiyan dikir
Şerê dilê me
Aloziya jiyanê
Nakokiyên evînê
Di nava hesret û hevşabûnan de
Bêhna xwe vedida
Destmêj dihate şikandin
Mizgeft dihate jibîrkirin

Çavên te dibûn qiyameta min
Di hembêza min de
Heyfa hesretê hildidan
Min dizanîbû ku
Herdem
Di axên te de
Cihê min hebû…

Min kenên te yên zarokane vedişart
Dikir mal û serweta dilê xwe
Kenên te yên zarokane
Herdem
Şermok bi şermok
Herdem
Mîna kewan kenbaz bûn…

Hestên malkambax
Wekî hespekî kihêl
Dibeziya
Di nava şox û şenga bedena te de
Bi sê dengan
Bi rêderketî
Bi awirên sermest
Te nedixwest hesp bireve
Agir bitemire
Dem biqede...



**Zor î zor…**

Pêsîra hesretekê digirim
Şîr dimijim ji veqetînan
Gilî û gazinan dikim
Tu nayê
Dûr î dûr…

Klamekê ji şevê didizim
Davêjim paşila te ya şil
Guhdar nakî
Sar î sar…

Xewnên firotî dikirim
Direşînim rûyê te yê reş
Tu nabînî
Bêxem î bêxem…

Ne fikrên pînekirî
Ne jî
Bêriyên hinekirî
Nikarin têkevin şikeftên hişê te
Dûr î dûr…

Kulmek peyvên şêrîn
Dişînim esmanên dilê te
Nabihîzî
Fêm nakî
Zor î zor…

Halê min çi ye?
Haja te pê nîne…
Derdê min çi ye?
Haja te pê nîne…
Ecêb î ecêb…



**Kerb…**

Awirên ku bi firê bikevin
Bi baskşikestî diketin erdên min
Min dîdit ku
Paleya herî xedar
Dasa devê te bû
Bê poşmanî
Bê westan
Genimê dilê min diçand…

Ramûsanên ku li rêya min bisekinin
Qedexe û heram bûn
Di nava boxçika dilê min de
Ji xeynî kerban
Şadiyek nedihat dîtin…

Nanê tisî bû kenên te
Dişibiyan moriyên ber gorê
Her tim
Asê dima çîroka evîna me
Bi kuştina hêviyên nû ve…

Hêrsên te yên pûç dicûyam
Serê sibehê
Bi janên xwîngirtî
Bi kelegirî, destvala…
Serê şevê
Bi bêzariyan, bêwext…
Hest û peyvên riziyayî
Ji kevirekî girantir dibû li ser pişta min

Te tasek ava jehrî dida
Goştê canê min
Bi “kerem bike”yan
Min hîs dikir ku
Bextê min ê
Di nava êşên te de bigevize, biherime
Êşên min ê
Bi heywaxan bigihîje qata heftan

Êdî nanivîsim
Pênûs jî naxwaze
Serê birînan bixurîne
De -kerem bike-
Ji cihê mayî
Goştê canê min bixwe….



**Bêrî…**

Herkes tiştekî hez dikir
Min kêleka çavên te hez dikir
Di nava tenêtî û qerebalixan de
Hesreta te hebû
Tenêtî dibû tu
Qerebalix dibû tu...

Herkes bêriya tiştekî dikir
Min bêriya kenên te dikir...
Ez diçûm
Kenên te jî
Bi min re dihatin...
Her der dibû kenên te
Herkes bi kenên te dikeniya
Şa dibû
Ne derd dima ne jî keder...

Herkes tiştekî dixwest
Min destên te yên biçûk dixwest
Destên te
Rûyê min
Dilê min
Bedena min germ dikir
Di destên te de
Tîna tenêtiya min dihat şikandin
Di destên te de
Min derdên xwe ji bîr dikir
Di destên te de
Ji nû ve dihatim afirandin…



**Qîzê…**

Qîzê
Di porên te de çend bihar digerin
Çend bihar bêwestan mane
Çend bihar xwe kuştine
Ez dêranê dêran
Niha li bin siya mijangên te digirîm
Li bin çavên te digirîm

Qîzê qet nebe tu negirî
Qet nebe tu dilê min nede ber derd û keseran
Qet nebe tu bikene
Qîzê tu negirî ez bimirim
Ez bimirim tu neêşe
Ez bimirim tu negirî...

## Şair

Şairekî nivîsand: di rihê min de zarokekî gunehkar heye...
Şairekî nivîsand: çav jî dixapînin feleka kirassorê...
Şairekî nivîsand: şereba dil jî tê firotin qedera tenêmayî...
Şairekî nivîsand: emrê min tu yî jiyana xayin...
Şairekî nivîsand: qedeha jehrî tu yî axiretfiroşê...
Şairekî nivîsand: eşq wekî cixareyê ye bikişînî nabe nekişînî nabe...
Şairekî nivîsand: nivîs jî dixeyidin wekî çavên te...



## Çend rist…

Dilê min min fêm kir ku eşq nayê nivîsandin.

***

Got: keçê mala bavê te xera be ,
Te çi zû ji bîr kir destên min ên kevokî...
Got: kuro dîno ew do bû îro îro ye...

***

Qîzê ez gune me
Min ji te re negot
Devê te şekir e şekir
Neşo qîzê neşo
Ez ê bibim mêvanê te...